

karkerên hemû welatan û gelên bîndest yekbin !

PALE

Organa Rêxistina Şoreşvan û Welatparêzên Kurdistan

KÛRDÎSTAN DEVRÎMÇÎ - YURTSEVERLERÎ ÖRGÛTÛ ORGANI



www.arsivakurdi.org

D A X U Y A N Î

Xwendeyanên delal,

Ev bû demeke dûr û dirêj, ku kovara PALE nehat weşandin. Lê niha hejmara 9 an, ku hejmara dawin e, tete weşandin.

PALE, wek rêxistinekê, di bihara sala 1978 an de hat saz kirin. Wek kovar ji, cara pêşin di zivîstana 1978 an de, dest bi jîna xwe ya weşanî kir. Heta bi niha, bi awakî rêk û pêk, 9 hejmar derketin. Dive bête zanin, ku di mercên Ewropayê de weşandina kovareke weha ne tişteki gengaz e. Ji her aliyê ve dijarî heşe. Ew dijarî pir caran dibin sebebên dawîhati na jîna kovar û rojnameyên li derveyê welêt. Lê bi qasî hinde ji, PALE li hember her têxlit dijarîyan rawestî û piştî wan hemûyan da erde. Ji na xwe ya weşanî domand. Bê guman, di vî karî de ji deyndare heval, heval bend û hogîrên xwe ye. Herçendî ji aliyê naveroka xwe de xwedî hin kema siyan jî bû, disan di karîbî xwe bi gelên xwe bide qebûl kirin. Herweha di karîbî behra xwe texe nav tevgera rizgarîxwaziya netewî û civakî ya gelên Kurdistanê. Bê guman, em bi xwe ne di wê bir û baweriyê de ne, ku kovare hec şaşî nekirine, şaşî kirine. Lê sed mixa bin, ku em niha nikarin li wan şaşiyên kovare hur bibin û rexneyan li xwe bigirin. Heke kovare jîna xwe bidomanda, dê ev lêhûnerên û rexne ji bihatana nivîsin.

Çi kovar û çi jî rêxistîna me be, xwe heta bi niha ji têkoşîna gelên me, nemaze ya hogîr û hevreyên me yê RIZGARÎXWAZÊN NETEWÎ YÊN KURDISTANÊ (K.U.K), çihê nehatin. Wek perçek ji wan û tevgera wan têkoşîna xwe didomandin. Lê bele, bi dirêjahiyê hinde xebat û kefteleftê, em bixwe gihan wê baweriyê, ku di jîna pratîkî de, hin nerekûpêkî heşe. Ne heçve ye em bêjin, ku gava soresger nerekûpêkî û jêkdûriyan bibînin, dive bixebitin da ku wan jî nay rakin. Ji lewre jî, kongreya me ya siyan li ser van pîrs û pîrgîrêkên pratîkî rawestî û ji wan re çare dit. Xebata xwe ya rêxistinî û weşanî bi xebata welêt ve, çareke qin bi awakî xurt, perçin kir. Ji xebata xwe ya bi her tun û rengî re reçeke nu dani.

Wek me li jor jî got, dê ji vir û bi ha de, PALE neyê weşandin. PALE, dê ji iro pê de, jîna xwe di bin navê QERÎN de bidomîne.

Em ji hemû heval, hogîr, hevrê, dost û hevalbendên xwe yê RIZGARÎXWAZÊN NETEWÎ YÊN KURDISTANÊ (K.U.K) doz dikin, ku ji hemû caran bêtir alîkar bin. Alîkar bin da ku gelên me rojekê zûtir bigihêjin armanca xwe ya ji bo Kurdistanê serbixwe, demokratîk, sosyalîst û yekbûyî. Alîkar bin, da ku piştî cunta leşkerî ya faşîst, ku dem û dezgeha xwînreji ya burjû vaziya monopolîst, tevkar û koledarên Tirkiyê ye, rojekê zûtir bête hilweşandin. Alîkar bin da ku nîrên koledariyê, emperyalîzm, faşîzm û feodalîzmê rojekê zûtir bîn şikandin.

Bijî kongreya sisyan ya PALE !

Bijî têkoşîna RIZGARÎXWAZÊN NETEWÎ YÊN KURDISTANÊ !

- ★ PALE kovara te ye. Wê bixwîne û bide xwendin!
- ★ Jê re kiryar, alîkarvan, hevalbend û hogîran bibîne!
- ★ Jê re xwestekên xwe binivîsin û nûçeyan bighîninê!
- ★ Wê, dengê azadî û rizgarîxwaziya gelên Kurdistanê yê li hember zorkerî û koledariyê nas bikin!
- ★ Wê, li dijî bindestiyê, emperyalîzmê, bêdadî, xwînmeji û faşîzmê bizanin!
- ★ Xebat û têkoşîna wê, ya xwe bipejirînin!

TU DIKARÎ KOVARÊ JI NAVNÎŞANA JÊRÎN BIXWAZÎ

ZIMANÊ BELENGAZ Û TENGEZARÊN KURDISTANÊ
HOZAN QANI' YÊ NEMIR (II)

Me, di hejmara 8 an ya kovara PALE de, bi kurtebirî ji jînenîgariya hozanê nemir QANI' kad kiribû. Lê mixa bin, ku ji ber şaşiya çapê navê afirandineke wî, ku divyabû di rûpela 20 an de derketa, nehatiye nivîsandin. Navê vê afirandinê jî "Paşmerge" ye.

A rastî, bi kurtî di derheqa afirandinên QANI' yê nemir de nivîsandin û selixên huner û hunermendiya wî dan, pir û pir çetin e. Hozan û helbestvanekî weha bêhempa nabe ku bi çend rêzan ve payeya laşî ya xwe bibîne. Ji ber ku jîn û keftelefa wî hem perçek e ji dîroka têkoşîna rizgarîxwaziya netewî û civakî ya gelên Kurdistanê yê bîndest û hem jî perçek e ji dîroka bêjeya şoreşgerî û hemçax. Ji bo ku mirov bîkaribe dîroka têkoşîna rizgarîxwaziya netewî û civakî ya gelên Kurdistanê, nemaze ya sedsala bîstan, qenc têbigihê divê mirov bala xwe bide afirandinên QANI' yê nemir. An na, dê bibe kêmasiyeke mezin. Lê vê gavê em ne di wê îdîayê de ne, ku em ê bi vî karî ve rabin. Ji xwe ev kar jî di çarçewa kovarekê de nabe. Ji wê çarçewê der e. Herçendî di van salên dawîn de hin ji Kurdên Başûr di warê bêjeyî de tiştine hêja pêk anîn jî, lê dîsan ne li gor daxwaza dil e. Hin pir tişt hene ku weşertî mane. Ji hemûyan girîngtir ew e, ku hin devên xezîne û defînen bêjeya Kurdan bi temamî nehatine vekirin. Ne hewce ye bête gotin, ku di bin nîrên koledarî û bîndestiyê de bicîhanîna vê armancê pir dijwar e. Nemaze di rewşa îro de, ku her texlît zor û zordestî, qeyd û bend li ser gelên Kurdistanê û hebûnên wan yê netewî hene, pêrebûna vî karî gelekî zor e. Lê dîsan jî, mirov dikare bêje, ku li gor kêsên hene, nemaze di warê vejandin, geşkirin û lêhûnêrîna afirandinên QANI' yê nemir de, tu pêngaveke berbiçav nehatiye avêtin. Bê guman, ev hozan ji payeya hewce û laşî bê par hatiyê hiştin.

Heçî Kurdên Bakur in, bi a me, di derheqa QANI' yê nemir de tiştêkî nizanin. Wan, heta bi weşandina bend û gotara berî vê, tu tiştêk li ser wî, heta navê wî jî, nebihîstibûn. Ev ji wan re sûc û tawaneke giran nayê hejmartin. Karbidestên bûrjûvaziya monopolîst, tevkar û ko ledar ji mêj ve rê li ber wan girtine da ku çand, bêje û zimanê xwe yê zikmakî ve mijûl nebin. Hingî ji destên wan hatine, em bêtir

bi zincîrên koledariyê ve girê dane. Bi vî awayî qelandina rehên jî-
na me ji xwe re kirine û dikin armance bingehîn. Di rojêke holê de,
gava ku em li ber xwe nedin û van zincîr, qeyd û bendên bêbav neşi -
kênin, bê gumen em hem sûckir û hem jî tawanbar in. Divê em bi xwe û
gelên xwe bawer bin. Bi dostên xwe yê sereke û stratejîkî, ku rista
sosyalîst, tevgerên rizgarîxwazî yê gelên bindest û tevgera prole-
terya cîhana sermayedar in, ji dil û can bawer bin. Ne ku wek tevgera
PDK-Îraqê, ya di bin serektiya Barzanî ya kevneperest, feodal û bûr-
jûva, baweriya xwe bi emperyalîzma Amerîkayê, siyonîzmê û rejîmên e-
rebî yê kevneperest û noker bînin... Hozan QANI' vê reya rast ya ji
bo rizgariya gelên Kurdistanê, bi helbestên xwe yê giranbiha ve pir
xweş berpêşî me dike. Ew, serketina tevgera rizgarî û azadîxwaziya ge-
lên Kurdistanê bi tenê di reya sosyalîzmê de û di serketina sosya-
lîzmê de dibîne. Ji lew re, ew hîn di sala 1944 an de, berî ku şerê em-
peryalîstî yê didwan dawî were, li bajarê Sûrdaşê li Kurdistanê Ba-
şûr, baweriya xwe bi serketina eniya sosyalîst ya serek Stalîne ne-
mir tîne. Vê baweriya xwe, ji bo ku wek belgeke têkeve nav rûpelên di-
rokê, dirijîne ser kaxezan. Ji ber ku wî bidestxistina mafê çarenûsî
yê gelê Kurd, ku mafê wî yê demokratîk û netewî yê bingehîn e, di çar-
çewa serketina misoger ya sosyalîzmê de didît. Di dawiyê de baweriya
QANI' rast derket. Eniya sosyalîst bi ser ket. Wek QANI' bi xwe dibê-
je, reya Lenîne mezin' bû dermanê her texlît nexweşî û nakokîyan. Ca-
reke din mizgîniya rizgarî û azadiya gelên bindest, ref û sinifên he-
jar yê kedkarên cîhanê da. Ev e bang û qêrîna QANI' yê nemir.

ŞORIŞÎ SERKEWTÛ

Ey Kurde, bes e qurbeserî girye w nalîn
 Ta key be kizî w laremilî a'ciz û xemgîn
 Sûdeki nîye bit perestî w xizmetî Çerçel
 Rastwû be dess, rûkere derbarî Stalîn
 Çend sal e ke tu fêl û diroy Çerçel ebînî
 Netnasîwe hêsta ku , ke ew xêle le ser çîn?
 Gişt zalim û zordar û hemû xiwênmij û destbir
 Dujmin be gelî Kurd û, hemû qabilî nefrîn
 Ew komele bedkare le bo nef'î xisûsî
 Famalî eka, heqî hemû milletî bê tîn
 Etkê be kerî barî Ecem gahê be naheq
 Ya ho ştirî jêrbarî Ereb tawê be sed qîn

. . . .

Kurde were binware deway derdit le kiwê ye !
 Her peyrewî Lînîn e, deway çarî nexoşin

Nabî be ker û e'bdî hemû begler û tucar
Lort nabê be baxat û, geda nabê be perjîn
Siwal naka le kes, siwalkerê ya beçke gedayê
Kuraxa le ser text û le naw doşekî zêrîn
Xiwênî min û tu nakine piyale le bo axa
Bîxwatewa axat, wekû şerbetî şîrîn
Mal û ser û rûhim be fîday agirî sûre
Ew agire pir cûşe eka "recmî Şeytîn"
Çend xoş e! ke ew roje bilîsey girî agir
Wek berqî xezeb dêt û deçê lêrewa ta Çîn
Toley min û to weregrê Kurde le Çerçel
Ew roje ke wa xetmî eka şorişî Berlîn

Bi kurmancî

ŞOREŞA SERKETÎ

Kurdo, bes e ev xwelîliserî, girîn û nalîn
Ta kîngê hejarî û stûxwarî, dilteng û xemgîn
Feyde tune bibî perest û xizmetkarê Çorçîl
Rastbêj be, berê xwe bide ber bi aliyê Stalîn
Çend sêl in ku tu fêl û derewên Çorçîl dibînî
Ma te hê jî nenasîye ku ew tof li ser çî ne?
Hemû zorker û zordar û hemû xwînmêj û destbir
Ji gelê Kurd re dijmin in, hemû hêjayî nifir
Ew komika pîskar ji bo xêr ê bêra taybetî.
Talan dike mafê hemû netewên jar û bê hêz
Dike ker bo barê Ecem carina bi neheqî
Yan hêştirê jêrbarê Ereb carina bi sed rîkî

. . . .

Kurdo were binhêre li kû ye çara kuls te
Her reya Lenîn e derman û çara nexweşiya te
Nabî ker û kolê hemû beg û baziğsanan
Lord nabe bêî bax û gedan, nabe bêî sêncan
Pirs nake ji kesî, ji xwezok yan ji gedê piçûk
Kuraxe li ser text û di nav doşeka zêrîn
Xwîna min û te nakine piyale ji bo axan
Da ku axê te vexwe wek şerbeta şêrîn
Mal û ser û ruhê min gorî be bo agirê sor
Ew agira pir gur dike kevirkirina Şeytên
Çendî xweş e! roje ku çirûsk û tîjkên girê êgir
Wek birûskê were xezebê û ji vir here ta Çîn

Heyf û tola min û te bistîne Kurdo ji Çorçîl
Ew roja ku wisên dawî tîne şoreşa Berlîn

SIR WINSTON CHURCHILL(Çorçîl) (1874 - 1965): Ji keremên xwe re li ko
vara PALE, hejmar 7, rûpel 11 an mêze bikin.

Fêl: Hîle. Tof: Rivd, komik, grûb. Destbir: Kesê ku destên mirov di-
bire, zordar, zorker, mirovkuj. Taybetî: Xweser, xisûsî, negelemper.
Hêstir: Deve. Jêrbar: Barkêş, hembal, xulam. Rik: Kîn. Bazirgan: Tu
car. Lord: Peyveke bi îngilîzî ye û di maeneya dewlemend, maldar di-
de. Gede: Zarok, zar, kole, bende, benî, xulam. Sênc: Percan, perçîn, per
jîn... Tiştê ku ji hej û pejan yan ji têlên bi dirî, çilpî, şitlên da-
ran û yan jî ji diriyên li hawîrdora erd û bostanan tête çêkirin, ku
heywan yan jî kesên dereke nekevin navê. Hin caran jê re "sinc" jî tê
te gotinê. Lê heçî sinc e, navê darekê ye, ano dara sincê. Herweha ji be
rên wê darê re jî sinc tête gotinê. Berêwê fêkiyek xweş e. Dendikên
wî wek dendikên xurmê ne. Qaşilê wî fêkiyê zer yan jî sorê vekirî ye.
Hundirê fêkiyê, gava ku hişk be, wek ard e. Xwezok: Kesê ku ji xwesti-
nê têr nabe. Çavbirçî, dilbij, dilbijok. Kuraxe: Kurê axê. Piyale: Qe-
deh, îskan, îstekan, perdax, şûşe...

Kurdistan, bi qasî ku welatekî bindest e jî, her dem di dilê dij-
min de bûye nişana tirseke mezin. Her çî gava ku dijminên koledar na-
vê Kurdistanê bihistine, tirs û xofê, xwe di dilên wan de hingavtiye. Bê
guman, ev yeks ha bi merc û rewşa siyasî, leşkerî û erdnîgariya strate
jîkî ya Kurdistanê ve girêdayî ye. Ji alîkî de hebûna dewlemendiyên
ser û binerdîn yên mişe û ji alîkî din ve jî, di nivê Rojhelata Navîn
de xwedî cîhekî stratejîkî bûna Kurdîstanê, her dem bala hêzên emper-
yalîstên koledar kişandiye. Van hêzên hov, bêlî ku bala xwe bidin mafên
miro vtiyê yên herî piçûk, ev welat di nav xwe û tevkarên xwe de li
hev parve kirin. Bi reya mirî û karbidestên bûrjûvaziyên koledar Kur-
distan bindest kirin û xwîna gelên wê rêtin û mêtin. Her gava ku doza
azadî û rizgarîxwaziya gelên Kurdistanê, çî bi reya şer û çî jî bi a
wayê aşîxwaziyê be, pêşde hatiye, wan xwe dirêjî vê doza dadmend ki-
rine. Dîroka têkoşîna netewî ya gelên Kurdistanê bi meşq û nimûnên bi
vî tun û rengî ve tijî ye.

Di helbesta jêrîn ya hozan QANI' yê nemir de, ku wek gotûbêjekê
ye ku di navbera du karbidestên koledar de derbaz dibe, paxev û tirs
dijminên zordar xweş tête zimên. Lê, wek hozanê bêhempa di hemû helbes
tên xwe de bi me nişan dide, nexweşî û nakokiya ku di tevgera rizgarî
xwaziya netewî û civakî ya gelên Kurdistanê de heye, sebebê sereke yê

serneketina wê ye. Ev sebeb jî bi pêkhatina serektiya tevgerê ve girê dayî ye. Anî, serektiyeke kevneşopî yê kevneperest, feodal û bûrjûva sebebê sereke yê serneketina tevgerê ye. Li ber çavan e, ku di heyama me de dawîya rola serektiyeke klasîkî yê kevneşop hatîye. Tevgerên rizgarîxwaziyê êdî perçek ji şoreşên sosyallîstîyê ne. Divê êdî proleterya û çek û rexta wê, ku ramana marksîzmê û lenînîzmê ye, pêşengiya siyasî rêxistinî û ramanî ya tevgerên rizgarîxwaziyê netewî bike. Di tevgera rizgarîxwaziyê netewî û civakî ya gelên Kurdistanê de pêknehatina vê serektiyeke û sazûnaya vê pêşengiyê astenga herî mezin e. Dema ku ev merc pêk hat, serneketina gelên Kurdistanê jî misoger dibe. Em bi her awayî bawer in, ku dê gelên me roje kî rojan bigihêjin vê armanca pîroz.

TIRSINOKIY DUJMIN

- S. - Paşa merheba! çon e ehwalit?
 Çon e tekbîr û pîlanî selit?
 Bo çî eciz î, bo doşdamaw î?
 Xerîk pîlanî kêm lêqewmaw î?
- N. - Efendim, qurban! lêman qewmawê
 Le rût be dûr be, halman şêwawê
 E'bdî herdûkman Kurdî serşêwaw
 Nawî "azadî" exene "nawaw"
 Kê bê hacetî malman bişûrê?
 Sed sal derîkeyn, ew her netûrê
 Be nînesikî karekerman bê ...
 Be şew, be roj bareberman bê!
- S. - Paşa, metirse! to le ser xo be!
 Taze niwêneryan çûwete "Badkobe"
 Niwênerî Kurdan xan û axa ye
 Basî azadî la ka w ba ye
 Kurd heta axa w xanî tiya mabê
 Xatirit cem bê, ke be hîç nabê!
- N. - Hey qurbeserman! Kurd wa enasî?
 Wam zanî ziring î, ke çî zor kas î
 Heta hejarê eçête meydan
 Hezaran axa ebê be qurban
- S. - Bîrî pê mede, paşa metirse!
 Azadîy Kurdan le min bipirse!
 Ewen bizane, kakî îstî'mar
 Xoy xiste nawîyan be çar û naçar

Birbirî kirdin, her yek le layê
Her yeke bo xoy bû be kiwêxayê
Te mame Îngîlîz mamî xomen bê
Tirsit ne le Kurd, ne le Goran bê:

- N. - Efendim! Êsta Kurdit nedîwe
Kurdan Îngîlîzyan zor baş nasîwe
Qisey "Kapîtan" le gel werey dêl
Hiç ferqî nîye le dêhat û xêl
Sed sal sîr bixwa ya zurna lêyda
Kes giwêyî nadatê, le şar û dê da

Bi kurmancî

TIRSONEKIYA DIJMIN

- S. - Paşa roj baş!, rewş û ehwalê te çilo ye ?
Tevdarek û plana te ya salê çi ye ?
Tu çima dilteng î, ji bo çi kêfnexweş î?
Mijûlî plana kîjan lêqewimî yî ?
- N. - Ez benî, qurban! va ye li me qewimiye
Bila ji te bi dûr be, rewşa me têk çûye
Kolên me herduken, Kurdên xwelîlisere
Navê azadî hildidin ser zimên û zare
Dê kê bişo hewceyiyên mala me
Em sed sal derbixin jî, ew her bi hêrs nabe
Bi nanezikî karkirê me ... be
Hem bi şevê, hem bi rojê barbirê me be
- S. - Paşe, metirse! tu ewle û li ser xwe be
Vê gavê nînerên wan çûne "Badkobe"
Nînerên Kurdan her xan û mîr û axe ye
Pirsa azadî li ba wan her ka û ba ye
Kurd heta ku axe, mîr û xan tê de mabe
Ewle û bawer be, ku ji wan hiç tişt nabe
- N. - Hey xwelî li serê me!, Kurdan wer dinasî ?
Wilo dizanî zene yî, lê pir nenas î
Heta belengaz û hejar diçin meydanê
Her bi hezaran axe dibine qurbanê
- S. - Mêjî pê mewestîne, Paşe metirse!
Azadiya Kurdan tu her ji min bipirse
Hinde bizane ku kekê emperyalîzm
Destên xwe êxiste nav wan bi çar û neçar

Hemû birbirî kirin, her yek li aliyek
Vêca her yek jî ji xwe re bûye kêwxweyek
Heta mamê Îngîlîz ap û mamê me be
Tirsa te ne ji Kurd û ne jî ji Goren be

N. - Ez benî! vê gavê te qet Kurd nedîtine
Kurdan Îngîlîz pir baş û xweş nas kirine
Peyva "Kêpîtan" di gel reyîna dêlê de
Hiç ferq tune çî li gund û çî di xêlê de
Sed salî sîr bixwe yan jî li zurnê bide
Kes guhê xwe nade çî li bajêr be, çî li gunde

Ehwal: Peyveke bi zimanê erebî ye û pirhejmara "hal" e. An, rewş, rewş
û pergâl. Tevdarek: Hazirî. Plan: Vîlik, nexşe. Hewceyî: İhtiyac.

Karkir: Kesê ku karekî pêk tîne yan dike. Ev peyv ne di maeneya kar-
ker de ye. Nîner: Kesê ku temsîla rêxistin, partî, sazî, dewlet yan jî
mirovekî dike û berdevkê wê yan wî ye.

BADKOBE: Xuya ye ku ev navê cîh û deverê ye. Lê me bi xwe ,bi vî
navî cîhek nedît. Heye ku şaş hatibe nivîsandin. Dibe ku ev nav ne
ku Badkobe, lê belê "Baqûbe" be. Tiştê ku xuya ye, ev helbest li ser
tevgera rizgarîxweziya Kurdistanê Rojhelat hatiye nivîsandin. Herwe
ha di helbestê de şerê emperyalîzmê, nêmaze emperyalîzma Îngîlîst-
nê, tête kirin. Di dema ku Îngîlîz Îraq bindest kiribûn û roleke
mezîniyê di Şahişahiya Îranê de dilîstin, Kurd pir bi hevdu dan kuş-
tinê. Ji axê, beg, mîr, xan û şêxên Kurdan pir kes ji xwe re kirin pe-
ya. Her gava ku daxwazên wan ji aliyên mîriyên Îraq û Îranê de nehg
tana pêk anîn, Îngîlîzan dest diavêt giregirên xwe firotî yê Kurdan
û pê gef û gur didane. Îraq û Îranê... Danûstandina wan "giregir" jî
ji aliyê Îngîlîzan de xweş dihate bi kar anîn. Îngîlîzan pir caran
ev celeb "giregir" vedixwendin baregehên xwe. Wê çaxê yek ji bare-
gehên Îngîlîzan yê giştî li bajarê Hebanîyê li Îraqê bû. Lê belê
baregeha leşkerî jî li Baqûbê bû. Baqûbe li ser reys Bexdê, Xaniqîn
û Derbendixanê ye. Bi qasî 100 km li bakura rojhelata Bexdê ye. Be-
rî niha bi 40-50 salan piraniya rûniştevên wê Kurd bûn. Lê niha
ew bajar jî hatiye pişaftin û rûniştevên wê Ereb in. Wek me berî
niha jî got, heye ku navê vî cîhî şaş hatibe nivîsandin. Birbirî
kirin: Perçe-perçe kirin, kerî-kerî kirin, ji hev veqetandin.

Kêwxwe: Ev peyveke pir kevn e. Di zaravayê kurmancî de nayê bi kar
anîn. Dibe ku wînda bûbe. Lê di zaravayê soranî de heta bi îro jî
maye. Ji gotina "kêw" (kiwê, ko, koy ...) û "xwe pêk têt. An, kesê ku
bi xwe wek çiyayekî ye. Ji vir maeneya "mezîniyê, serek, pêşajo, pêşeng,
rêber" û hp. dide. Lê herweha îro di maeneya "muxtar" de jî tête
bi kar anîn. Di kurdî de peyveke din jî heye, ku nêzîkî peyva "kêw-

xwe" ye. Ew jî peyva "keya" ye. Heçî ev peyv e, care pêşîn di maeneya "padişah, qiral, mîr, fermanber, parêzêr, bervedêr, fermanber" de ye. Di kurdiya kevn de bi maeneya "gundî, rencber, kar, ked" jî hatiye bi kar anîn. Ji bilî vê, di maeneya mecazî (figuratîv) de, di şûna "dîlpak, pak, paqij, bêguneh, stûxwar" de jî cîhê xwe girtiye. Herweha, carina di şûna her çar hêmenên jînê jî hatiye bi kar anîn. Di hin devokên zaravayê kurmançî de, di şûna "muxtar" de jî peyva "keya" tête bi kar anîn. Wek; keyayê mezrayê... Heçî di dîroka kevnare de ye, wek navnîşane kê dihate pêşiya navên fermanber û serekan. Wek; Key-Xusrew, Key-Kawûs Key-Kûbst, Key-Aksar û hwd. Ji xêncî vê, navê yek ji bavikên Farisan e, ku ji wan re "Keyaniyan" digotin. Ew di dema Aşîmenîdiyan de karbi-dest bûn.

GORAN: Navê xêl û eşîreteke kurdî ye. Li Kurdistana Rojhelat, di navbera herêma Mukriyan û Caf û Loran de, rûdinin. Zaravayê wan devokekî xweser î soranî ye, ku jê re goranî dibêjin. Me dil hebû, ku em li ser dîroka wan ya pir helez rabîwestin. Hem ji aliyê dîrokî û hem jî ji aliyê zimanasiyê de lê hûr bibin. Lê sed mixa bin, ku ev karekî xweser e. Tevî ku pirseke pir tevlihev û dijwar e jî, divê em paşê li vê babe tê ve mijûl bibin.

Kapîtan: Peyveke bi zimanê îngîlîzî ye. "Captain" (keptin tête xwendinê). Kurd pir caran vê peyvê wek "qaptan" bi lêv dikin. Ji ber wezna helbestê, me ew peyv wek helbestvan nivîsand. Ev peyv, di zimanê deryavaniyê de, bi maeneya "keştîajo, pspûrajo" ye. Lê di zimanê leşkerî de bi maeneya "serleşker, fermanber" e. Xêl: Qabîle.

QANI' yê nemir, di hemû helbestên xwe de, li dijî her texlît sitem û zordariyê radiweste. Bi xwe dizane, ku zordestî, kanî û maka hemû pîsî û neqenciyan e. Heçî di warê civata Kurdan de ye, hozan pir bi xurtî şerê rist û nîzama kevnare ya feodalîzmê dike. Kedxwerî, xwînmêjî û sitemkariya hêmenên feodal yên wek mîr, xan, beg, axe û hwd. hiç bi carekê qebûl nake. Ev helbesta ha, ji şerê QANI' yê têkoşer yê li dijî hêmenên feodal re, meşq û nimûneke berbiçav e. Em hewce nabînin, ku li ser wê zêdetir binivîsin.

Helbest bi xwe di sala 1944 an de hatiye nivîsandin. Wek tête zanîn, wê çaxê tevgera rizgarîxwaziya netewî ya Kurdistana Rojhelat û Başûr bi xurtî ber bi pêşde diçû. Hêzên emperyalîst yên koledar ji pêşdeçûnavê tevgerê gelekî ditirsiyan. Ji ber vê yekê, ji bin ve, pal û pişta xwe didane hêmenên derebeg û feodalên Kurdistanê. Hozan QANI' jî, wê çaxê li gundê Kewlûs yê bajarê Şarezorê aşvaniyê dike. Gava ku pal û piştdana derebeg û feodalên dibîne, baweriyên xwe yên wek kakelekî zêrîn û herweha yên ji bo rizgarbûns ref û sinifên kedkar, di vê helbesta jêrîn de dinitirîne.

TOLE ESÎNIM

Be serma ramebûre kakî zalim
Le destî zulmî tu, wêran e malim
Be şew îşîkçî malî xan û axam
Be roj kulkêşî pûş û dirk dal im
Eger rakem le bo milkî yekî tir
Lewêş de qurbeser her-e'ynî halim
Le des qanûnî pîsî mîr û axa
Le her la bim be des zulm û enalim
De zalim ! nûreme, xuwat ragire bom
Biçêje ! şerbetî gurz û gopalam
Be tenha çaw le quncanî bizane
Esînim heqî zulmî çend salim !
Heqî cûtyar û pale w rencberanim
Heqî çewsenewey xom û minalim
Be zebri çekoşî Kewe mêşki ejî
Qewarey pûçelî Zuhakî zalim
Çi xoş e : bête dî amencî berzim
Îtir koşk û telerî mîr nemalim
Çi xoş e ! hêzî rencber rabimelêm
Qela w zîndanî axay betfesalim
Çi xoş e ! min bilêm: Axa çî karey ?
Bilê: "Em ro le gumrik da hemal im"
Çi xoş e ! mîr be i'nwanî kirêkar
Bilê: "Îşît nîye ? Em ro betal im!"
Çi xoş e ! Qani'a bê xof û endîş
Bilêy: Zalim le kiwê ye ? Min zewal im.

Bi kurmancî

DÊ TOLE BISTÎNIM

Bi ser me de ranebihure kekê zordar
Ji destê sitema te wêran e mala min
Bi şevê xulamê mala xan û axê me
Bi rojê barkêşê pûş, strî û dirî me
Heke baz bîdim û herim mala yekî din
Wir jî xwelîliser im, her eynî ye rewşa min
Ji destê qanûn û destûra mîr û axê pîs
Her li kû bim ji destê sitemê dinalim
De zorker, gera min e! Xwedê te bihêle bo min
De biçêje şerbeta gurz û gopala min !

Tu bi tenê çav lêqirpendinê bizane
 Dê bistînim heqê sitema çend salên e
 Maf û heqê cotkar, pale û rencberên xwe
 Heqê gerdenxwariya xwe û zerokên xwe
 Bi derba balyoza Kawe mêjiyê wî dijî
 Li laş û gewdeya pûç ya Dehakê xwînrêje
 Çi xweş e! bête cih armanca mezin ya min
 Êdî koşk û lîwanka mîr venamalînim
 Çi xweş e! ku bi hêza rencberan vemalim
 Keleh û zîndana axeyê xwe yê pîskar
 Çi xweş e! ku bêjim: Axe çi karî dikî ?
 Bêje: Îro di gumrikê de barkêşî dikim"
 Çi xweş e! ku mîr bi navê karkeriyê
 Bêje: Kar li ba te tune ? Ez îro vala me"
 Çi xweş e! ku Qani' bêî saw, xof, tirs û paxav
 Bêje: Zorker li kû ye ? Ez im neman û zewal.

Tole: heyf. Ranebihure: Derbaz nebe. Barkêş: Kesê ku bar dikişîne, bar bir. Ger: Dor, dog. Heçî peyva dor e, bi zimanê erebî ye. Bi kurdiya paqij jê re ger tête gotin. Wek; "Niha gera min e", "Ger hate min". Biçêje: Tam bike!, bitamîne!, li tamê binhêre. Gerdenxwarî: Bêî azadî, belenga - zî, hejerî, tengezarî.

Kawe: Li kovara PALE, hejmar 7 û rûpel 20 an mêze bike.

Dehak: Li kovara PALE, hejmar 7 û rûpel 20 an mêze bike.

Lîwank: Eywan, sivder. Saw: Teror, tirs, xof. Paxav: Endîşe, meraq. Zewal: Neman.

Bi qasî ku nivîsevanî, helbestvanî û hozanî ne pêşeyê hêsan e jî, di bin nîrên koledarî û zordestiyê de jîna nivîsevan, helbestvan û hozanan jî gelekî tehl e. Di rewşeke holê de, hingî ku ji destên mî riyên xwînrêj û kedxwar tîn, jîna wan ji wan re tehtir û diwartir dikin. Wan digrin, li wan didin, wan diajon, afirandinên wan bend û qedexê dikin. Wek helbestvan QANI' yê hêja jî dibêje, çekê nivîsevanan pênivîs û qelama wan e. Bê guman e, ku birîna pênivîsê ji ya şûr û ri man diwartir e. Ji ber vê, li welatên ku zordarî û kedxwarî pêl vedi din, şûna ku nivîsevan bi xelatên zêrîn ve werin xelat kirin, bi girtin, kuştin, lêdan, zîndan, dest û ziman birînê ve tîn xelat kirin. Ni-mûna vê hovîtiyê li welatê me jî bi awakî bê hed tête kirin. Nihs pir nivîsevan, helbestvan, hozan, lêger û lêhûrnêr, rojnamevan û zanyar

hatine girtin. Dest û zimanên wan hatine birîn û afirandinên wan hatine bend û qedexe kirin. Zîndan û girtîgeh ji wan re bûne mal û war. Têvî vê jî, ew dev ji pêşe û karên xwe bernadin. Zîndan ji wan re dibin dibistan.

Helbestvanê bêhempa QANI' jî ji van reyan derbaz dibe. Ew, di sala 1963 an de, di gel kurê xwe Wirya, li Îranê tête girtin. Rejîma Şahînaşê faşîst wan diavêje zîdana "QECER" ya li Tehranê. Ew di zîndanê de nexweş dikeve û dikeve ber haletên mirinê. Di wê rewşa tehl û ne xweş de, ew radihêje pênivîsa xwe û van rêzên zêrîn dinivîse.

LE BENDÎXANE DA

Axirîn malî jiyanim kuncî bendîxane ye
Em kelepçe, merhemî zamî dilî dêwane ye
Zor demêke çawirwanî zirzirey zincîr eke
Seyrî em zincîre ken! wek zêwerî şahane ye
Bûkî azadîm ewê w xiwênim xenes bû dest û pêy
Helqe helqey pêwenim, bo pilpile w lertzane ye
Ger çî dujmin wa ezanî! min be dilî lal ebim
Baş bizanê! kuncî zîndanîm qutabîxane ye
Bîrî azadîm le zîdana firawantir ebê ...
Qurbeser ew dujminey hîway be bendîxane ye
Girtin û lêdan û kuştin a'milî azadî ye
Top û şêstîr û kelepçe lam wekû efsane ye

.....

Çawirwanî şorişêkim !! a'lemî rizgar bike
Miletim bo ew mebeste, kirdewey şêrane ye
Çekî şorişgerîy min ... nûsîn û bîr û bawer e
Raperîn e, helmet e, pir ne'retey Kurdane ye
Ger be azadî nejîm, mirdin xelst e bo leşim
Nokerî w serdanewandin ... karî namerdane ye

.....

Qani' im em ro le zîdana be azadî ejîm
Sed hezar lehnet lewey wa, nokerî bêgane ye.

Bi kurmancî

DI GIRTÎGEHÊ DE

Cîhê jîna min ya dawiyê her quncika girtîgehê ye
Ev destebenda ha, merhema birîna dilê dêwane ye

Demêke dirêj e, çavnêriya zingzinga zincîrê dikim
Ca li vê zincîrê binhêrin! mîna qeyd û benda şahan e
Bûka azadiyê divêm, cemidî xwîna min li dest û pê
Helqên qeyd û benda min bo helqên guhar û lertzînê ye
Herçendî dijmin wisan dizane ku ez bi dîlî lal dibim
Baş bizane! dîsan quncika girtîgeha min dibistan e
Baweriya azadiyê di zîndanê de qewîntir dibe
Xwelî li serê wî dijminî ku hevî bi bendîxanê ye
Girtin û lêdan û kuştin hemû ji bona azadiyê ye
Top, şêstîr û destebend ba min wek çîrçîrok û efsane ye

.

Ez çavnêrê şoreşekê me!! da ku cîhanê rizgar bike
Gelê min ji bo wê armancê her pêrabûyê şêrane ye
Çekê şoreşgeriya min ... nivîsîn û bîr û bawerî ye
Rabûn e, êrîş e, tijî hawar û hawirza Kurdane ye
Heke bi azadî nejîm, mirin xelat e ji bo laşê min
Nokerî, xulamî û serçemandin ... kerê namerdane ye

.

Ez Qani' im, îro di girtîgehê de bi azadî dijîm
Sed hezar laenet li yê wilo ku nokerê biyanîyan e.

Girtîgeh: Bendîxane, zîndan. Destebend: Kelepçe. Dêwane: Wek dêwan.
Çavnêr: Kesê ku li benda (li hêviya) tiştêkî ye. Dîl: Esîr, yexsîr.
Dibistan: Xwendegêh, mekteb, medrese. Efsane: Çîrçîrok. Pêrabû: Kesê
ku bi karekî ve radibe, kesê ku dike, kir. Şêrane: Wek şêran. Hêwirze:
Hawar, qazî, qêrîn. Namerdane: Wek nemerdan (xiniz, xayîn). Biyânî: Dere-
ke, bêgane, xerîb.

Me dil hebû ku em hîn dirêjtir li ser jînenîgarî û hunermendi-
ya hozan QANI' ye payebilînd binivîsin. Herweha çend meşq û nimûne-
yên din ji helbestên wî pêşkêşî we bikin. Lê sed heyf û mixa bîq, ku
ev hejmara dawîn ya kovara PALE ye. Ji ber vê yekê, jê re nema kesa
me heye.

Têbînî: Bêl destûr, rêdan û ageha kovara PALE, weşandin, wergerandin
û çapkirina vê nivîsarê qedexe ye.

YOLDAŞLAR

Ezen ezilen, sömüren, sömürülenlerin savaşımının acımasızca sürdürüldüğü bir çağdayız. Bu çağ emperyalizm ve proleter devrimler çağıdır. Özellikle bu çağda gelişmekte olan ulusal ve sosyal devrimler mücadelesi emperyalizme büyük darbeler indirmiş, 1917 Ekim Devrimi ile dünyada ilk sosyalist ülke olan Sovyetler Birliğini yaratmıştır. 1917 Ekim Devrimi gerçekten Doğu'nun ezilen halklarının, emekçi yığınlarının yüzyıllar boyu süren uyuşukluğuna son veren ve onları dünya emperyalizmine karşı savaşa sürükleyen dünyada ilk devrim olmuştur. Böylece geri kalmış Doğu halkları ile ileri Batı halkları arasında bağlar kurarak bu halkları emperyalizme karşı ortak bir savaş kampında birleştirdiği görülmektedir. Ayrıca Batı'nın proleterlerinden Sovyet Devrimi aracılığı ile Doğu'nun ezilen halklarına kadar varan dünya emperyalizmine karşı yeni bir devrimler cephesi kurarak sosyalist Batıyla köleleştirilmiş Doğu arasında köprü kurmuştur.

Diğer önemli bir durum ise ulusal sorunun yeni bir yön izlemesidir. Şöyleki: 1917 Ekim Devrimi öncesi ulusal sorun ülkelerin iç sorunu, burjuva demokratik devrimlerinin bir parçası iken 1917 Ekim Devrimi sonrası ulusal sorun ülkelerin bir iç sorunu olmaktan çıkmış, uluslar arası bir sorun ve dünya devrimci hareketlerinin bir parçası olmuştur. 1917 Ekim Devrimi öncesi ulusal kurtuluş hareketlerine önderlik etmekte olan burjuva dünya görüşü, 1917 Ekim Devriminden sonra ise gerici burjuva milliyetçi görüşün barutunun tükendiğini göstermiştir. Tüm dünyanın ezilen mazlum halkları 1917 Ekim Devriminin yarattığı güçle ulusal kurtuluş savaşımının hızlandığı bir çağın başladığını göstermiştir.

II. Emperyalist paylaşım savaşında bir çok halklar Ulusal Demokratik Halk Devrimi yoluyla bağımsızlıklarını gerçekleştirmişlerdir. Artık emperyalizm gün gittikçe bocalamakta, mazlum halklar ise zafer üstüne zafer kazanmaktadırlar. Son Asya, Afrika, Latin Amerika halklarının özgürlük ve bağımsızlık mücadeleleri emperyalizmin sonunun yaklaştığını müjdeleyen zafer naralarıdır. Emperyalistler düşmüş oldukları bunalımdan kurtulmak için tüm güçleri ile Orta Doğuda gelişmekte olan ulusal ve sosyal devrim mücadelelerini bastırma çabasındadırlar. Bu tükenmekte olan ömürlerini biraz daha uzatmak için oynadıkları son oyundur.

Orta-Doğu'da kaynayan volkan emperyalistleri ve onların uşaklarını yakacaktır. Korkunun ecele fayda etmediğini göreceklardır. Zafer ergeç mazlum dünya halklarının ve Orta-Doğu'daki ezilen halkların olacaktır.

Y O L D A Ş L A R

Evet, bu kısa değerlendirmeden sonra gelelim Orta-Doğu'da önce mini gün geçtikçe korumakta olan KÜRDİSTAN mücadelesine.

Kürdistan denince ilk akla gelen şey işgal, ilhak, talan ve işgallere karşı direnmesini bilen Kürdistan Halklarının mücadelesidir.

Kürdistan yüzyıllardan beri özvarlığı hayatsızca inkar edilmiş yeraltı ve yerüstü zenginlikleri talan edilmiş, dili ve kültürü asimle edilmiş, ilhak ve işgallere maruz kalmış, ekonomik gelişmesi engellemiş bulunan siyasi ve ekonomik alanda bağımlı kılınmış uluslararası bir sömürgeci.

Kürd halkı kölelik zincirlerine karşı her zaman direnmesini bilmiştir. Tabii ki askersel bir güç olarak direnmenin özgürlük mücadelesini başlıbaşına sonuca götürmediğini de görmüştür. Neden yüzyıllardan beri sömürgeciye karşı savaşın bitmediği Kürdistan'da özgürlükler elde edilmiyor ? Nedenine gelince, tabii ki önemli nedenleri vardır. Esas neden bu güne dek Kürdistan'da gelişmekte olan ulusal direniş hareketlerinin, biçimsel farklılıklar dışında, genelde burjuva, feodal- aşiretçi bir önderliğin başını çektiğini görmüş olmamızdır. Şu bilinmesi gereken bir gerçek ki, 1917 Ekim Devrimi sonrası ulusal hareketlere önderlik eden proleterya veya onun dünya görüşü olan idolojik ve politik örgütsel öncülük olmuştur. Bunun dışında ulusları kurtuluşa götürmenin mümkün olmadığını bilmeliyiz. Bu nedenle Kürdistan'da gelişmekte olan ulusal direniş hareketlerinin ciddi bir önderlikten yoksun oluşları bu güne dek Kürdistan halklarının zaferini geciktirmiştir. Bu nedenlere etkileyici olan uluslararası denge politikasını da unutmamak gerekir. İşte Kürdistan'ın bu karmaşık süreç içerisinde örgütlenme aşamasına girmesi ve bu örgütlenmelerin doğurduğu sapmaları da görmek gerekir. Geçmişini bilmeyenler geleceğini çizemezler. Evet, geçmişimize baktığımız'da Kürdistan'daki son yıllara dek oluşan örgütlenmeler, Marksizmden uzak tamamı ile gerici burjuva milliyetçi görüşün egemen olduğu örgütlenme anlayışının hakimiyetini görmektediriz.

Özellikle 1639 Kasrı Sîrîn antlaşması ile başlayan ve 1923 Lozan antlaşması ile düğümlenmiş bulunan Kürdistan'ın sömürgeleşme süreci ile başlayan mücadeleler, günümüze dek varlığını sürdürmüştür. Örneğin, Kuzey-Kürdistan'da 1920 Koçgiri, 1925 Şeyh Sait, 1928-1931 Ağrı-Zilan, 1938 Dersim hareketi ile ulusal direniş hareketleri bu konuda önem arz eder.

1947 Mahabat Kürt Cumhuriyeti'nin yıkımından sonra Irak Kürdistan'ında 1947 lerde örgütlenip, 1961 yılında İ-KDP önderliğinde başlayan hareketin genel örgütlenme anlayışında diğer hareketlerden biçimsel farklılıklar teşkil etmekle birlikte, öz itibari ile değişik bir stratejiyle savaşılmamıştır. İ-KDP hareketi ayrıca doğurduğu sonuçların önemli bir yanında, merkezi bir örgütlenmenin Kürdistan'ın her dört parçasında somutlaştırmak, merkezi yapının dışında hiç bir parçanın bağımsız örgütlenip, bağımsız hareket etmenin söz konusu olmadığı bir anlayış ile mücadeleyi sürdürmesidir. Bu nedenle 1965 yılında İKDP- hareketinin bir uzantısı olarak kurulan TKDP hareketimiz ise onun bir uydusu statüsünde hareketini sürdürmüştür. Bu burjuva milliyetçi örgütlenme anlayışı son 1975-hareketinin emperyalizmle bütünleşen karakteri ile Kürt halkı'nın son bir kez büyük bir darbenin kurbanı olduğu görülmüştür. Oysaki Kürt halkını göçe zorlayan, yıkımını pekiştiren temel nedenlerin başında gelen gerici feodal-aşiretçi ve burjuva karması önderliğin dünya görüşünde yatmaktadır. Böylece bir kez daha tarih sayfalarının bize öğrettiği şu olmuştur:

Burjuva ve burjuva dünya görüşü değil ulusları kurtarmak, olsa olsa tutsaklık zincirlerine haps etmek olacağını somutlaştırmıştır. Kürdistan devrimci yurtseverleri yıkılan bu oluşum karşısında ilk etap'ta adeta bir panik ve arayış içine düştüler. Fakat özellikle Kuzey-Kürdistan'da dialektik gelişimin bir eseri olan marksist düşüncenin gün geçtikçe gelişmesi kısa zaman içinde marksist düşünceye sahip olan kadroları yarattı.

İşte bu kadrolar geçmişlerini değerlendirerek Kuzey-Kürdistan'da ki mücadeleyi dahada yoğunlaştırdılar. Bu süreç içerisinde bir süre grup ve örgütün de oluştuğunu görmemek elde değil. Tabii ki başlangıçta hiç bir yapı marksist dünya görüşünün egemen olduğu bir oluşum değildi. 1975 yılına dek İKDP hareketinin bir yan kolu olan TKDP hareketimiz, 1975 yılından sonra partide egemenliği olan feodal-burjuva karmasını yok etmek için marksizmi kurtuluş bilen kadrolarca yoğun bir çalışmaya girildi.

İki yıllık uzun bir uğraşı sonucu Kürdistan tarihine altın harflerle yazılabilen tarihi bir kongre 1977 yılında gerçekleşti. Uzun bir mücadelenin verildiği kongrede devrimcilerin, yurtseverlerin egemenliği ile pekişmesi, gerici güçlerin ise yenilgisi ile sonuçlanması, Kürdistan devriminde önemli bir gelişme olarak değerlendirilmelidir. Daha önceleri hakim olan gerici dünya görüşleri tasfiye edilmiş, marksizm-leninizmin Kürdistan gerçeğinde somutlaşması ile bağımsızlığın gerçekleşeceği simgelenmiştir. İşte bu süreç KÜRDİSTAN ULUSAL KURTULUŞ (K.U.K) güçlerinin yeni bir zafer süreci, aynı zamanda Komünist Partisinin'de inşaa süreci olmuştur.

Bu durumda merkezi örgütlenme anlayışı geçersiz kınıyor, gerçek marksist bir örgütlenmenin ilk nüveleri olan bağımsız örgütlenmenin egemen kılındığı bir yapı gerçekleşmiş oluyor. İşte bu karmaşık süreçte Avrupa'daki biz devrimci ve yurtsever güçlerde Kürdistan gerçeğinde somutlaşması görülmeyen bazı durumlar karşısında doğal olarak tavırsız kalınmayacağını bilerekten gerekli uğraşları vermeye çalıştık. Bu uğraşı bizim halklarımızın özgürlüğüne olan inancımızın bir simgesi olarak görmek ve değerlendirmek gerekir. Tabii ki PALE'nin ilk oluşumunda ülke somutu ile tamamen bütünleşebilmesi erkendi denilebilir. Çünkü PALE'nin oluşumunda Kürdistan'da tam anlamıyla kristalleşmiş bir siyasi hareketi nesnel olarak görmek henüz mümkün değildi. Fakat bir süreç içinde kendimize en uygun ve siyasi alanda da hiç bir çelişki arz etmeyen ülkede devrimini üstelemiş T-KDP(K.U.K) siyasi hareketi ile her alanda bağları sıkılaştırmayı zorunlu gördük. Bu bağların derçinleşmesinden sonra Avrupa'da K.U.K siyasi hareketinin genel çıkarları doğrultusunda mücadelemizi sürdürdük. Fakat PALE'nin tarihi sürecinin örgütsel anlamda sona erdiğini iddiasındayız. Bu iddiamız aynı şekilde T-KDP (K.U.K) siyasi hareketimizin yukarıda bahsettiğimiz doğrultudaki görüşleriyle aynı paraleldedir. Tarihi sürecimizin dolması ile artık kendimizi direk olarak ana merkeze bağlı kılmamız gerektiğinin bilincindeyiz. Çünkü sadece örgütsel anlamda da olsa Kürdistan bağımsızlık mücadelesine direk olarak bağlanmayan bir hareket günümüzde başarılı olamaz. Aksi halde ayakları havada marksizmden ve ülke gerçeğinden soyut bir yapıyla karşı karşıya kalırız. Biz böyle bir aşamada artık kendimizi ana merkezimiz K.U.K hareketine tamamen adapte etmeyi kaçınılmaz görüyoruz.

Böylece şimdiye kadar örgüt yapısı içinde çelişki arzeden ve bir formalite konumunda olan yapıyı fesh etmeyi kongreye sunuyoruz. Çünkü bu çelişki örgüt yapısı ve formalite olsa dahi vardır. Marksistler çelişkilerin var olduğu süreçte savaşımın çelişkileri yürütüleceğini bilmelidirler. Oysa ki marksistler kendileri bu çelişkilerin üstesinden gelmesinde bileceklerdir. Sömürgeciliğe karşı verilecek olan savaşında bu tür pürüzlerin varlığına ihtimal bırakmamalıdır. Marksistler bu tür çelişkileri görüp, hareketin hedeflerini saptamakta gecikmemelidirler. Hedefsiz ve stratejisiz bir mücadele, mücadele değildir. Bizler hedefi ve stratejiyi belirlenmiş K.U.K. güçlerinin sömürgecilere karşı savaşmakla, Kürdistanın gerçek bağımsızlığı için mücadelesini sürdüren K.U.K. hareketinin uluslararası arenada bayrağını dalgalandırmaya hazırlanmalıyız.

YOLDAŞLAR.....

Kürdistan, Ulusal Demokratik Halk Devrimi mücadelesinde yüzlerce şehit vermiştir. Kürdistan Devriminde yılmadan varlığını koruyan ve korumakta olan K.U.K. saflarında kendimizi görmek ve bu uğurda savaşım vermek tarihi bir karar olmalıdır. Bu karara ülkesinin bağımsızlık, demokrasi, sosyalizm ve birlik mücadelesine inanmış tüm yoldaşlarımızın katılması güçlerimizi ve saflarımızı sıklaştıracaktır. Bundan kuşku duymuyoruz. Bu güne dek tarihi bir süreç yaşamış olan PALE'nin son bir sorumluluk görevini yerine getirerek gerçek kimliğine kavuşması kaçınılmaz bir karar olacaktır. Bu karara geçmeden önce K.U.K. siyasi hareketimizin uluslararası alanda esas ve temel belirleyici görevlerine de bakmak ve değerlendirmek gerekiyor inancındayız:

- 1- Esas temel yan K.U.K. güçlerinin mücadelesini uluslararası dünya kamuoyuna götürmek ve bu uğurda savaşımı sürdürmek.
- 2- Birinci esas temele bağlı olarak K.U.K. mücadelesinde cephe gerisine hazırlamak şartıyla somut koşullarda kadroların eğitimini sağlamak.
- 3- Verilmekte ve verilecek olan KÜRDİSTAN ULUSAL KURTULUŞLARI mücadelesine uluslararası alanda ve esas gücümüze dayanan oranda maddi alanda büyük destek sağlama, uğraş ve çabasını egemen kıldırmak.

Yukarıda sıraladığımız etkenler, uluslararası planda K.U.K. güçlerinin savaşımını belirleyecek temel görevlerdir. Bunun dışında çözüm gerçeği bir çözüm değil ve olamazda.

Bu değerlendirme ışığında bu-günkü K.U.K. güçlerinin uluslararası alandaki örgütlenme yapısında marksist düşünceden kaynaklanarak legal ve illegal mücadele yönteminde başlaç kurarak görevini sürdürmelidir. Örgütlenme yapısı hiyerarşik bir düzen içerisinde somutlaşmalıdır. Yani üstten alta doğru bir örgütlenme hiyerarşisi egemen kılınmalıdır.

YOLDAŞLAR

Yukarıda kısaca belirtmeye çalıştığımız gibi, tarihi süreç içinde oluşturulan Kürdistan Devrimci-Yurtseverleri Örgütü PALE'nin yine bu süreç içinde vazifesini başarıyla sonuçlandırdığını gördük. Bu tarihi süreç örgütümüz PALE'nin üçüncü kongresinde oybirliği ile alınan kararlar somutlaşmış bulunmaktadır.

Böylece bugüne kadar Kürdistan halklarının bağımsızlık, demokrasi, sosyalizm ve birlik mücadelesi doğrultusunda büyük kararlılık azim ve leninist disiplinle çalışan örgütümüz ve militanları, bundan böyle mücadelelerini K.U.K. siyasi hareketinin bir neferi olarak pratikleştirmeye karar vermişlerdir. Böyle bir aşamadan sonra kesinlikle belirtiriz ki Kürdistan Ulusal Demokratik Halk Devrimi mücadelesinde yılmadan uğraş veren, bu uğurda geriye dönüşün olmayacağını bizi örgütleyen K.U.K. siyasi hareketimizin Avrupa'daki yandaşları olarak bağımsızlık, demokrasi, sosyalizm ve birlik mücadelemizi ne sömürgeciler ne emperyalistler ve nede başka bir engelleyemeyecektir. Zaten bizi şimdiye kadar yaşatan, damarlarımıza kan veren ve ülkemiz Kürdistanın durdurulmaya çalışılan kalbini pompalayanda bu inançtır. Halkımızın inancı, özverisi, devrimci ruhu, onu ileriye götüren ve ona yol gösteren marksizm-leninizm den ayrı değildir. Biz marksist-leninistler de aynı ruhu taşıyoruz. 1978'de o günün koşullarına uygun olarak oluşturulan örgütümüz PALE, aynı zamanda PALE isimli mevsimlik (3 aylık) bir de dergi çıkarıyordu. Dergimiz PALE kültürel ve siyasi konularda çalışmalarını elinizdeki bu sayıya kadar (9 sayı) başarıyla sürdürmüştür. Daha önceki sayılarımızda da sık sık belirttiğimiz gibi, Avrupa şartlarında PALE gibi bir derginin yayın hayatı sürecinde bir takım zorluklarla karşı karşıya kalması doğaldır. Böyle bir yayının organının 9 sayı yapması gerçekten büyük başarı örneğidir. Bu başarı ise halkımızın özverisidir. Avrupa'daki Kürdistanlı emekçiler yayın organları, PALE'ye sahip çıkmış, onu maddi ve manevi olarak yaşatmışlardır. Bu yayının organımız PALE'nin kitlelere mal olduğuna somut bir kanıttır.

Zaten kitlelere mal olmayan bir yayın organınının (Bu siyasi hareketler içinde geçerlidir.) uzun ömürlü olması düşünülmez.

Devrimci mücadele sürecinde her gün yeni gelişmelerin kendini dayatması diyalektik-tarihsel materyalizmin genel bir doğrudur. Bu süreç başarılı ve ileriye yönelik bir mücadele vermek ancak bu gelişmelere uygun yeniliklerle olanaklıdır. Böyle olması halinde mücadele tarihi gelişmelerin gerisinde kalarak devrimci potadan uzaklaşır ve zamanla toplumsal gelişmelerin içinde eriyerek kaybolur. Bu gerçek devrim mücadelesinin çeşitli engembeli aşamalarda geçtiği doğrusuyla sıkı sıkıya bağlıdır. Biz'de bu genel doğrulardan kopuk olmadığımızı göre, aynı olguları özgül şartlarımıza uygulamak zorundayız. Örgütümüz: Kürdistan Devrimci-Yurtseverleri PALE'nin tarihi sürecini tamamladığını bu somut gerçeklerden hareketle kabul etti. Bu durum aynı şekilde yayın organımız PALE içinde geçerlidir. Yayın organımız PALE'de şimdiye kadar anlatmaya çalıştığımız gelişmelere paralel olarak tarihi sürecini tamamlamıştır.

YOLDAŞLAR.....

Dergimiz PALE'nin son sayısı olan bu sayımızda (9. sayı) örgütümüz ve yayın organımız PALE'nin tarihi süreçlerini tamamladıklarını kısaca anlatmaya çalıştık. Feki böyle bir aşamada yayın hayatı olmadan mı mücadele vereceğiz? Bu mümkün değildir. Böyle bir düşünceye saptanmak marksizme ters düşer. Siyasi hareketlerin iskeletini oluşturan yayındır. Bizim K.U.K. siyasi hareketimizin iskeletini oluşturan merkez yayın organımız XEBAT Ji bo rizgariya Kurdistan dir. Bunun yanın da bizimde içinde bulunduğumuz şartlara uygun bir yayın organı çıkarmamız kaçınılmazdır. Bu tarihi zorunluk göz önüne alındığında geniş halk kitlelerine seslenecek bunlar arasında örgütsel ve ideolojik bir bağ teşkil edecek şekilde en kısa zamanda yayın hayatımıza devam edeceğimizi tüm Kürdistanlı devrimci, demokrat ve yurtseverlere duyururuz. Şimdiye kadar yayınsal yaşamını Kürdistanlı emekçilerin katkısıyla sürdüren PALE'nin bundan böyle yerini QERIN'e bırakacağını devrimci çökmekle belirtiriz. Mücadelemizin bu yeni boyutunda yeni bir yayınlara yine halkımızın özverisine muhtacız. Kürdistanlı emekçiler tarihi süreç içerisinde gerekli olduğu her zaman özverilerini göstermişlerdir. Bundan böyle göstereceklerine, ülkemizin bağımsızlığına, halkımızın özgürlüğüne inancımız ne kadar sarsılmazsa, buna da o denli inançlıyız.

Bunun yanında, tüm K.U.K. militan ve sempatizan yoldaşlarımızın da yeni bir yayın hayatında her zaman olduğu gibi tüm olanaklarını seferber edeceklerine eminiz. Yoldaşlarımızın şimdiye kadar gösterdikleri özverili mücadele bize diğer tüm çalışmalarımızda olduğu gibi yayınsal hayatımızda da sarsılmaz bir güvence vermiştir. Bu konuya değinmişken, tüm sempatizan, militan yoldaşlarımıza ve Kürdistanlı emekçilere seslenmeyi görev biliyoruz: Yeni yayın organımız QÊRÎN'i en geniş emekçi halk kitlelerine yetiştirerek, yayınsal alanda geniş bir ağı kuralım! Yeni yayını ve diğer çalışmalarımız için bütün maddi ve manevi olanaklarımızı seferber edelim! Yayın organımızla, en ücra köşelerde olsak dahi göndereceğimiz yazılarla, mektuplarla yaşadığımız bölgedeki tüm kültürel ve siyasi faaliyetlerle ilgili raporlarımızla en sıkı diyalogu pekiştirmek için seferber olalım! Biz böylece halkımızın istemlerini somut verilerle dile getirebilir ve bu bağlamla sıhhatli çalışma platformunu hazırlayabiliriz. Öyleyse hep beraber yeni yayın organımız QÊRÎN'e abone olmaya ve yeni aboneler bulmaya hazırlanalım. Yayın organımızın çok yakında çıkacağını şimdiden tüm devrimci, demokrat ve yurtseverlere müjdeliz.

YOLDAŞLAR.....

Bu yeni süreçte, Kürdistan halklarının gelişmekte olan Ulusal Demokratik Halk Devrimi mücadelesi ve Türkiye proletaryasının gelişen iktidar savaşını karşısında hırçınlaşan Türk tekelci-sömürgeci burjuvazisi, efendileri emperyalistlerin icazetleri ile Türkiye'de faşist bir diktatörlük gerçekleşmiş bulunuyor. Bu faşist sömürgeci diktatörlük her gün binlerce devrimci, demokrat ve yurtseveri insanlık dışı işkenceden geçiriyor. Tutuklamalar, üzümleri aşırken, okullar hapisanelere ve işkencehanelere dönüştürülmüştür. İdam sehpelerindeki cellat yeni bir devrimciyi ve yurtseveri sallamak için sabırsızlanıyor. Kürdistan bir kan deryasına döndürülmüş ve ülkenin halkları toplam bir katliamla karşı karşıya gelmiştir.

Ama onların çabası sonuç vermeyecektir. Devamlı ileriye doğru dönen tarihin çarkları devrimci güçlerden yanadır. Sömürgeciler ve onların efendileri emperyalistler, faşist diktatörlüklerle sömürü düzenlerini devam edebileceklerini sanıyorlar. Ama nafile! Köhnemiş bu düzenin çeri tarihin çöplüğüdür. Zafere geç mazlum dünya halklarının, proletaryanın ve sosyalist sistemin olacaktır.

Emperyalist ve proleter devrimleri çağında, ulusal kurtuluş hareketlerinin büyük bir önem kazandığı, bu süreçte yeni bir gün, yeni bir mücadelenin başlangıcında yeni bir yayın aşamasına geçeceğimizi son bir kez daha belirtirken, " gün durma dinleme günü değil, gün savaşım günüdür " diye tüm mücadelecilerimizle sesleniyoruz.

M I Z G Î N Î

Hejmara yekemîn ya kovara QÊRÎN derket !

QÊRÎN têkoşîna gelên Kurdistanê ya li dijî koledariyê, emperyalîzm, faşîzm û feodalîzmê tîne zimên.

QÊRÎN mildarê têkoşîna ji bo avakirina Kurdistananeke serbixwe, demokratîk, sosyalîst û yekbûyî ye.

QÊRÎN kovara we ye. Wê bixwînin û bidin xwendin! Jê re binivîsînin û pê re bidin û bistînin!

Hun dikarin kovarê ji navnîşana jêrîn bixbixwazin.

QÊRÎN

Box 7031

163 07 SPÅNGA

SWEDEN

WEŞANÊN PALE

Dîwana CEGERXWÎN

Dîwana helbestvanê bi nav û deng, Cegerxwîn ya didwan SEWRA AZADÎ hat weşandin. 224 rûpel, biha 10.- DM

Dêmenên KURDISTANÊ

8 lib dêmenên Kurdistanê, bi reş û spî û çûbecûr hatin weşandin. Liba wan bi 1.- DM e.

STRANÊN REWANÊ

Stran û meqamên govendê yê Kurdên Sovyetistanê. 3 çûre, liba kasêtan bi 7,5 DM an e.

XWEŞXWAN Û STRANÊN ŞOREŞÎN

Stran û xweşxwanên kurdi yê şoreşî ji hevalê hunermend DILGEŞ, kasê, biha 7,5 DM

XWEŞXWAN Û STRANÊN ŞOREŞÎN

Stran û xweşxwanên kurdi yê şoreşî ji hevalê hunermend DILGEŞ, kasêta didwan, biha 10:DM

XWEŞXWAN Û STRANÊN ŞOREŞÎN

Stran û xweşxwanên kurdi yê şoreşî ji hevalê hunermend BIRÎNDAR, kasêta yekan, biha 10:DM

PALE YAYINLARI

CEGERXWÎN'IN ŞIIRLERİ

Unlü Kürt şairi Cegerxwîn'in, şiirlerini içeren SEWRA AZADÎ (Özgürlük Devrimi) adlı divanı yayımlandı. 224 sayfa, fiyatı 10.- DM

KURDISTAN'DAN MANZARALAR

Siyah-beyaz olarak basılan 8 çeşit kartpostal, tanesi 1.- DM

KÜRTÇE TÜRKÜLER

Sovyetler Birliği'nde yaşayan Kürtlerin müziği, 3 kaset, tanesi 7,5 DM

DEVİRİMCİ MARŞLAR VE KÜRT HALK TÜRKÜLERİ

Kürt ozanı DILGEŞ'ten devrimci marşlar ve Kürt halk türkülleri, kaset, fiyatı 7,5 DM

DEVİRİMCİ MARŞLAR VE KÜRT HALK TÜRKÜLERİ

Kürt ozanı DILGEŞ'ten devrimci marşlar ve Kürt halk türkülleri, ikinci kaset, fiyatı 10:-DM

DEVİRİMCİ MARŞLAR VE KÜRT HALK TÜRKÜLERİ

Kürt ozanı BIRINDAR'dan devrimci marşlar ve Kürt halk türkülleri, birinci kaset, fiyatı 10:- DM.

XEBAT

Türkiye Kürdistan Demokrat Partisi (KUK) yayın organı. Sayı 1,2,3,4,5,6. Özel Ek Sayı 1,2,3-Fiatı 3:- DM

STIMME KURDISTANS

Organ der Demokratischen Partei
Kurdistan - Türkei (K.U.K)
Nr. 1, Preis: 3.- DM

PALE, li benda alîkariya te ya bi her rengî ye. Piştê xebat û têkoşîna wê bigre û xwe jê dîr mexe!

postgirokonto . 431 60 94.4

PALE'nin mücadelesini destekle ve çalışmalarına yardımcı ol. PALE'ye her türlü yardımını esirgeme!

www.arsivakurdi.org

www.arsivakurdi.org